

Hejmara - 200

Bê dirave

MIZGÎN

1 - Sibat - 2026



Naverok

- 1 Wênesazî
- 2 Wêjeya Zarokan
- 3 Lîsk
- 4 Welatê me
- 5 Tu dizanî
- 6 Tendirustî
- 7 Tîp û gotin
- 8 Navdar
- 9 Bexçeyê Navan
- 10 Jîngeh mala me ye
- 11 Jêhatiyên Zarokan
- 12 çîrok
- 16 Bixwînin û fêr bibin
- 17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Şewekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Baran zagros
Rojhilat

Dîzayn
Mecid Alsadûn

Sererastkirina Kurdi
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

Sivoriya li daristanê rengîn bike wekî wêneya berê

لَوْنُ السَّنَجَابِ فِي الْغَابَةِ كَمَا فِي الرَّسْمِ الْمَرْفُوقِ



KEÇKOKÊN ME

Keçkokên me bilbil in
Li ser gul û nefel in

Dengê wan pir şêrîn e
Qendav û hingivîn e

Bi lîstokan dilîzin
Awazên xweş dibhîzin

Firokan difirînin
Çivîkan dicivînin

Diçin serê qelaçan
Çê dikin bûkên paçan

Dilîzin bi xanîkan
Nokan dixin bêrîkan

Keçkokên me nazdar in
Bişkojê serê dar in

Jiyan bi wan rengîn e
Ronahî û perwîn e

Leyla Reşo



Her çar cudahiyên di navbera her du
wêneyan de bibînin

أوجد الفُروقَ الأربعةَ بين الصُّورتينِ.





Bajarê Silêmaniyê

Ew li Başûrê Kurdistanê ye, di nivê deşteke xweşik de ye û bi sê çiyayan hatiye dorpêçkirin: Azmar, Goyja û Pîre Megrûn. Çiyayên li wir bi guherîna demsalan re reng diguherin; di biharê de kesk dibin, di havînê de zêrîn dibin û di zivistanê de spî dibin ji ber ku bi berfê tîn xemilandin. Zarokên Silêmaniyê ji van çiyayan hez dikin, ji ber ku ew çiya wekî qehremanên ku bajarê wan diparêzin. Silêmaniyê di sala 1784'an de ji aliyê mîrê Kurd Îbrahîm Paşa Baban ve hatiye damezrandin û wî navê bavê xwe Silêman Paşa lê kiriye. Silêmaniyê wekî "paytexta çandî" ya Başûrê Kurdistanê tê zanîn, ji ber ku bajarê gelek helbestvan, nivîskar û hunermendan e. Herwiha muzexaneyek mezin a tijî berhemên kevna heye ku dîroka dewlemend a herêmê nîşan dide.

مدينة السليمانية

تقع في باشور كردستان، وسط واد جميل، تحيط بها ثلاثة جبال: أزمر، قوبجة، وبيره مكرون. يتغير فيها لون الجبال بتغير فصول السنة، في الربيع تصبح خضراء، وفي الصيف ذهبية، وفي الشتاء بيضاء لأنها تتغطى بالثلج الأبيض. يحب الأطفال في السليمانية هذه الجبال؛ لأنها تبدو كأبطال يحمون مدينتهم. في سنة 1784 أسسها الأمير الكردي إبراهيم باشا بابان، وسماها على اسم والده سليمان باشا. السليمانية مشهورة بأنها «عاصمة الثقافة» في باشور كردستان — لأن الكثير من الشعراء، والكتاب والفنانين ينتمون إليها. فيها أيضاً متحف كبير مليء بآثار قديمة تظهر تاريخ المنطقة العريق.

Tu dizanî?



Şampanzî dikare fêrî zimanê
îşaretan bibe û dikare bi
îşaretên destan bi mirovan re
têkilyê bike.

أنَّ الشَّمبانزِيَّ قادِرٌ على تعلُّمِ لغةِ الإِشارةِ؟
ويمكُنُه التَّواصلُ معَ البَشَرِ بإِشاراتِ اليَدِ!

هل تعلم؟




Dirêjahiya zimanê zirafa yê 45
santîmetre û ew zimanê xwe
bikar tîne da ku bigihêje pelên
daran yên bilind!

أنَّ الزَّرافَةَ لديها لسانٌ طوله 45 سنتيمترًا؟
وتستخدِمُه للوصولِ إلى أوراقِ الأشجارِ
العالية!

Firçeya diranê min

Her sibeh, firçeya diranê min radiweste û ji min re dibêje: Were! Ez amade me ku diranên te biparêzim. Piçek macûna diranan lê bike û em ê dest bi serpêhatiya xwe bikin da ku bakteriyên di navbera diranan de ji holê rakin û bermayiyên xwarinê derxînin. Piştê devê xwe baş bişo da ku ez xwe jîndayî his bikim.

Hevalên min, ma hûn dizanin ku firçekirina diranan rojê du caran diranê we ji xerabûnê diparêze, pêwîst e ku hûn firçekirina diranan ji bîr nekin, nemaze piştî xwarina şirîniyan, herweha pêwîst e ku hûn her sê mehan carekê firçeya diranan biguherînin.



فرشاة أسناني

صديقتي كل صباح، تقف فرشاة أسناني
وتقول لي: هيا! أنا مستعدة لحماية أسنانك،
ضع عليها القليل من المعجون، ونبدأ
مغامرتنا، لننقض على البكتيريا بين الأسنان،
ونزيل بقايا الطعام، ثم اغسل فمك جيّداً،
لأشعر بالانتعاش.

أصدقائي هل تعلمون أن غسل الأسنان مرتين
في اليوم يحميكم من التسوس، وأنه من
الضروري، ألا ننس أن نغسل الأسنان، خاصة
بعد الحلوى، وكذلك أن نحرص على تغيير
فرشاة الأسنان كل ثلاثة أشهر.



Hevalên hêja, tîpên kême tamam bikin; ji bo ku hûn navan li gorî wêneyên wan tamam bikin.

The crossword puzzle grid is composed of white squares on a yellow background. The letters are arranged in a vertical column in the center of the grid:

		P					
		E					
		Z					
		K					
		û					
		V					
		î					

Surrounding the grid are several animal illustrations: a ram, a panda, a frog, a mouse, a fox, a giraffe, a turtle, and an elephant.



Salihê Heydo

Helbestvan û lêkolînerekî Kurd e, di sala 1956'an de li gundê Hesê Oso yê li gundewarê bajarê Amûdê ji dayik bûye, bi folklor û mîrata gelêrî ya Kurdî re eleqedar bû û wî hezar û 500 stran ji folklorê Kurdî berhev kirin, herwiha 86 pirtûk li ser mîrate û folklorê Kurdî amade kirin.

Ew stranbêje û ji muzîkê hez dike, li tembûr û hin amûrên din ên muzîkê jî dixê. Herwiha ew xwedî jêhatiya xêzkirinê ye, bi taybet xêzkirina bi pênuşên komirî.

Di demên dawî de wî li Zanîngeha Rojava Beşa Wêjeya Kurdî xwend û heta niha jî ew helbestên herî xweş ji bo zarokan dinivîse.

صالح حيدو

شاعر و باحث كُردي، وُلِدَ سَنَةَ 1956 في قرية حسبي أوسو في ريف مدينة عامودا. اهتم بالفلكلور والتراث الشعبي الكردي. فجمع 1500 أغنية من الفلكلور الكردي. وأعدَّ 86 كتابًا عن التراث والفلكلور الكردي. يحبُّ الموسيقى، ويعزفُ على الطنبور وغيره من الآلات الموسيقية، ويجيدُ الغناء، إلى جانب موهبة الرّسم، وخاصةً بأقلام الفحم. التحق مؤخرًا بجامعة روج آفا بمدينة قامشلو لدراسة الأدب الكردي. ومازال شاعرًا يكتبُ للأطفال أجمل القصائد.

**Hin Navên
bi tîpa - R**

Roj

Rojhat

Rûken

Rojîn

Rojvan

Ronaz

Rêwan

Dar û hewayaya paqij



Hevalno, hewayaya paqij ji darê dest pê dike!
 Dareke tenê dikare di rojekê de hewayê paqij bike ji qaseyek mezin ji
 tozê û qirêjiyê.
 Dar wekî parzûneke xwezayî tevdigere, gazên zirardar dikişîne û li şûna
 wan hewayaya paqij berdide û ev yek alikariya me dike ku em bi hêsanî
 bêhndayînê bikin.
 Ev jî girîng e:
 Dar qirêjiya hewayê li bajaran kêmtir dike.
 Germa havînê kêmtir dike û zivistanê jî zûhabûnê kêmtir dike.
 Ew jî bo çûk û kêzikên sûdmend mal e.
 Ji ber vê yekê, hevalên min, heke hûn li nêzîkî dibistan an mala xwe
 dareke biçûk bibînin, wê av bidin. Dibe ku niha biçûk xuya bike, lê rojekê
 ew ê bibe dareke xweşik ku hun ê di bin siya wê de bilizin.

الشجرة والهواء النظيف

أصدقاؤي، إنَّ الهَوَاءَ النَّظِيفَ يَبْدَأُ مِنَ الشَّجَرَةِ!
 فَشَجْرَةٌ وَاحِدَةٌ فَقَطْ تَسْتَطِيعُ أَنْ تَنْقِيَ الهَوَاءَ مِنْ
 كَمِيَّةٍ كَبِيرَةٍ مِنَ العُبَارِ، والأوساخِ خِلالَ يَوْمٍ كَامِلٍ؟
 الشَّجَرَةُ تَعْمَلُ فِلْتراً طَبِيعِيًّا تَمْتَصُّ الغَازَاتِ الضَّارَّةَ،
 وَتُطَلِّقُ بَدَلاً مِنْهَا هَوَاءً نَقِيًّا، يَسَاعِدُنَا عَلَى التَّنَفُّسِ بِسَهولَةٍ.
 وَهَذَا مَهْمٌ:

فالأشجارُ تُقلِّلُ تلوِّثَ الهَوَاءِ فِي المَدِينِ.
 وَتُخَفِّضُ حَرَارَةَ الجَوِّ صيفًا، وَتُخَفِّفُ الجَفَافَ شتاءً.
 وَهِيَ بَيْتٌ لِلطُّيُورِ وَالحَشَرَاتِ النَّافِعَةِ.
 لَذلكَ؛ يَا أَصْدِقَاءَ، إِذَا رَأَيْتُمْ شَجْرَةً صَغِيرَةً قَرِيبَةً مِنْ مَدْرَسَتِكُمْ
 أَوْ مَنزِلِكُمْ، اسقُوهَا قَلِيلًا مِنَ المَاءِ. فَقد تَبَدُّو صَغِيرَةً الآنَ،
 لَكِنَّهَا سَتَصْبِحُ يَوْمًا شَجْرَةً جَمِيلَةً تَلْعَبُونَ فِي ظِلِّهَا.



Xuşik û bira xeyalên xwe vedibêjin

إخوة يسردون أحلامهم

Du xuşik û birayêk hezkirin wan kom dike... Bi xeyalên xwe yên ku siberoja wan rengîn dike, cûda ne.

ثلاثة أشقاء تجمعهم المحبة... وتفرقهم
الأحلام الجميلة، التي تلون مستقبلهم.



ADEM MÎLAD ELÎ - 9 SALÎ YE

آدم ميلاد علي - تسع سنوات

Tu dixwazî di siberojê de fêrî çî bibî?
Ez dixwazim fêrî lîstina fûtbolê bibim,
da ku bibim lîstikvanekî jêhatî û bi
bawerî û coş li pey gogê bim.

ما الشيء الذي تتمنى أن
تتعلمه في المستقبل؟
أحب أن أتعلم ممارسة كرة
القدم، لأصبح لاعباً ماهراً،
وأجري خلف الكرة بثقة
وحماس.



LIYA MÎLAD ELÎ - 5 SALÎ

ليا ميلاد علي - خمس سنوات

Tu dixwazî di siberojê de fêrî çî bibî?
Ez dixwazim fêrî lîstina fûtbolê bibim,
da ku bibim lîstikvanekî jêhatî û bi
bawerî û coş li pey gogê bim.

عندما تنظرين إلى
السَّمَاء... ماذا تحبّين أن
ترسمي عليها؟
أرسم الغيوم البيضاء
والشمس المشرقة، لأن
السَّمَاء لوحة كبيرة جميلة.



MANÊSA MÊLAD ELÎ - 12 SALÎ

مانيسا ميلاد علي - اثنتا عشرة سنة

Eger tu bikaribî serdana cihekî cîhanê
bikî... tu dê biçî ku derê? Û çima?
- Ez dê biçim fezayê! Ez dixwazim
wêneyên gerdûnê bigirim û cîhanên
dûr ve bibînim.

لو كان بإمكانك زيارة مكان
في العالم... فأين
ستذهبين؟ ولماذا؟
سأذهب إلى الفضاء
الخارجي! أريد أن أصور
الكون وأستكشف العوالم
البعيدة وأسرارها.

Çîroka : **Hevalên Hirç**

kalo em dixwazin
tu jimere çîrokek
bêji.

Ki dixwaze
çîrokeke zivistanê
ya tijî evîn û germî
bibihîze?

Em ...Em



Naxwe bi baldarî guhdar bikin...Ev çiroka hirçê ku di şeveke berfî de germahiya mala xwe winda kir.


Hirç? Ew wekî panda ye?



Ew dişibihe wî, lê ew li daristaneke pir dûr dijî...



Ah! Sermayeke zor e. Divê ez zû agir bibînim






Ez ê agir bidim
te...Lê bi
mercekî

Çi ye mercê
te?



Tu hingivê
xwe yê xweş
bide min



Na...Divê ew
baweriya xwe
bi rovî neyîne

Hirç jî wiha
fikirî



Naaaa
aaa

Na rovî, ezê rêya xwe
bibînim, kenê te yê
xapînok armanca te
eşkere dike.





Çi bikim? Gelo ez şaş bûm?



Hinek germahiyê bistîne, ji ber ku parvekirin dilan germ dike.


Mişko tu ji min biçûktirî, tevî wê tu germahiya mûmê dide min



Zarokno, bi vî awayî hirc nas kir ku germahiya rastîn ne bi agir tê, lê bi evîn û hevkarîyê tê.


Germahiya dil ne ji agir tê, lê ji dayîne tê






Heta agir jî eger du dar an zêdetir kom nebin, pênakeve... Wekî dilên me


Naxwe em wekî hirç in, em dicivin da ku bi hev re germ bibin hahaha



Çi xweş e hahaha! Dawiya herî xweş ji çîrokê re




Zarokên min, ji bir nekin... Di her zivistaneke sar de, di hundirê malbatê de germahî li benda we ye.



Cilşo

غَسَّالَةٌ

Washing machine



Ûtî

مِكْوَاةٌ


Iron



Melkes

مِكْنَسَةٌ

Broom



Perwane

مِرْوَاةٌ

Fan

مزكك

1 - شباط - 2026

